



# Bernameya elektrîk û enerjîyê

KURMANJI

**Bernameya elektrîk û enerjîyê  
bernameyeka pîşeyî ye û  
bidestxistina dîplomeya  
pîşeyî armanca wê ye.**

Bernameya elektrîk û enerjîyê ji te re yê ku hez dîke di warê tesîsa elektrîkê, sîstemên berhemsaziya otomatîkirî, teknîka enerjî, jîngeh û avê yan komputer û pevgihandinê de kar bike.

Tu dikarî piştî qedandina xwendinê yekser kar bikî yan xwendina xwe li xwendîngeha bilind ya pîşeyî berdewam bikî. Tu dikarî jî ji xwe re kursên zêde bixwînî da xwendina xwe li xwendîngeha bilind bidomînî.

## ÇAR PISPORIYÊN CUDA

### Otomatîkî

- Tu dê zanyariyan li ser teknîka elektrîkî, teknîka komputerî û teknîka xebitandin û sexbêrkirinê werbigirî. Ev pîsporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, teknîkerê otomatîkiyê di çarçoveya xanî, pîşesazî yan prosesan de kar bikî.

### Teknîka komputer û pevgihandinê

- Tu dê fêrî tesîskirin, îdarekirin û veçêkirinê sîstemên komputer û pevgihandinê bibî. Ev pîsporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, teknîkerê berhemên elektronîk, teknîkerê xizmetên malê yan teknîkerê şebekeyan kar bikî.

### Teknîka elektrîkê

- Tu dê fêrî tesîskirin û veçêkirina saziyên elektrîkê, alarm û sîstemên televîzyon û komputeran bibî. Ev pîsporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, teknîkerê tesîsê, teknîkerê elektrîka pîşesziyê yan teknîkerê rêyên hesinî – elektrîk û îşaret – kar bikî.

### Teknîka enerjîyê

- Tu dê zanyariyên li ser xebitandin û wezîfeyên xizmetkirinê di warên enerjî, jîngeh, av û prosesan de werbigirî. Ev pîsporî îmkanê dide ku tu wek, bo nimûne, operatorê xebitandinê yê teknîka enerjî û germkirinê yan operatorê xebitandinê yê teknîka av û jîngehê kar bikî.

### Tiştên ku tu dê di vê bernamêyê de fêr bibî

Tu dê zanyariyan li ser berhemsazî, tesîskirin û belavkirina sîstemên elektrîk, enerjî û avê werbigirî. Tu dê zanyariyan li ser teknîka elektrîk û enerjîyê, otomatîkî, teknîka komputer û pevgihandinê û jêrxana teknolojiya înforsiyonê (IT-yê) jî werbigirî. Tu dê pirsên ewlehiyê wek standard û ewlehiya înforsiyonê bixwînî.

Bona mirov xwe ji ziyarên karî biparêze û tenduristiyeka baş pêk bîne, giringiyeka mezin di vê bernamêyê de li ser pirsên jîngeha karî ye.

### **Bername weha hatiye rêxistin**

Madeyên dersê di bernameyên pişeyî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê. Di bernameyên pişeyî de, tu dê zêdetir madeyên pişeyî, yê ku jê re madeyên taybetmend tê gotin, û kêmtir madeyên ku te li dibistana bingehî xwendine bixwînî. Teknîka komputer û pevgihandinê, teknîka elektrîkê, teknîka enerjîyê û mîkatronîk madeyên taybetmend yê hevbeş yê vê bernameyê ne.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bername-kûrkolîn (programfördjupning). Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

### **Awayên xebatê**

Bername li ser pirsên ku tu dê bi serê xwe yan bi yê din re çare bikî ava dibe. Tu dê şiyana xwe ya înisyatîf-girtinê û behremendbûnê xurt bikî, û zanyariyên zêdetir li ser îmkanên birêvebirina şirketeka şexsî werbigirî. Tu dê hîn bibî ku bi metodên serdemê plankirin, pêkanîn, dokumentkirin û kalîteparastin ya karî bikî. Tu dê fêrî bijartina techîzatan, metodan û awayê karkirina ewle bibî.

### **Projeya lîseyê**

Tu dê di dawiya Bernameya elektrîk û enerjîyê de projeyeka lîseyê di warê pişeyî yê ku te bijartiyê de amade bikî. Tu dê bi wê nîşan bidî ku zanyariyên pêdvî yê ji bo destpêkirina karê ku te ji bo xatirê wî xwendiyê li bal te hene.

### **Fêrbûna li cihê karî**

Hin beşên xwendinê herî kêmtir 15 hefteyan li cihê yan çend cihên karî bi rê ve diçin û jê re arbetsplatsförlagd lärande (apl) – fêrbûna li cihê karî – tê gotin. Ev parçeyeka giring ya perwerdeyê ye. Apl tecrîbeyan û herweha kontaktan yê ku dikarin di dema lêgerîna karî de ji te re bisûd bin dide te.

### **Şagirdîkirin**

Heger xwendingeh di çarçoveya bernameyê de perwerdeya şagirdîkirinê ya lîseyî pêşkêş bike, tu dikarî wê hilbijêrî. Maneya wê ew e ku tu dê heman zanyariyan werbigirî lê dê herî kêmtir nîva xwendina xwe li cihê yan çend cihên karî bikî.

### **Balkişandin**

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên bingehî yê xwendina bilind bi dest bixî. Ji bo bidestxistina şertên bingehî yê xwendina bilind tu dikarî li gor dilê xwe di çarçoveya hilbijartina ferdî û bername-kûrkolînê de, heger xwendingeh wê pêşkêş bike, kursên pêdvî bixwînî. Ew du kursên zêdetir yê zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê û kurseka zimanê îngilîzî ne. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pişeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.